

Taybetmendîyên Şêwezarê Şêxbizînî

The Characteristics of the Sheikhbizinish Subdialect

Zülküf ERGÜN¹

Zülküf ERGÜN | <https://orcid.org/0000-0001-8784-5636> | zulkufergun80@gmail.com
Assoc. Prof. Dicle University, Sezai Karakoç Faculty of Letters, Department of Eastern
Languages and Literatures, Diyarbakır, Türkiye

ROR ID: <https://ror.org/0257dtg16>

M. Emin ÖZGÜR

M. Emin ÖZGÜR | <https://orcid.org/0009-0009-6018-1353> | m.eminn06@hotmail.com
Teacher, Ministry of Education, Konya, Türkiye

ROR ID: <https://ror.org/00jga9g46>

Citation:

Ergün, Z. & Özgür, M. E. (2025). Taybetmendîyên Şêwezarê Şêxbizînî. *Nubihar Akademi* 24, 23-47. 10.55253/nubihar.2025.1767012

Submission Date	16.08.2025
Acceptance Date	31.10.2025
Publication Date	31. 12.2025
Article Type	Research Article
Peer-Review	Double anonymized - Two External
Ethical Statement	It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.
Plagiarism Checks	Yes – intihal.net
Conflicts of Interest	There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.
Complaints	The author(s) has no conflict of interest to declare. For any complaints: nubiharakademi@gmail.com
Grant Support	The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.
Copyright & License	Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0 .
Indexing	EBSCO, DOAJ, ERIH PLUS, Ulrich's Periodicals Directory, Linguistic Bibliography, MLA
AI Policy	The author(s) declares that they have not used AI in producing this paper.
Author Contribution	Zülküf ERGÜN %70; M. Emin ÖZGÜR %30.

1 Yazarın alan editörü rolü bu sayı için askıya alınmış ve kendisi herhangi bir makalenin değerlendirme süreçlerinde rol almamıştır. / *The author's role as a section editor has been suspended for this issue, and he did not participate in the review process of any articles.*

Puxte

Şêxbizinî piştî zarên kurmancî û zazakî wek binzarekî kurdîya başûrî, cureyê sêyem ê zimanê kurdî ye ku li Tirkîyeyê tê axaftin. Şêxbizinîyên ku bi vî şêwezarî diaxivin, di sedsala 16em da di encama milmilaneyê Osmanî û Sefewîyan da ji nav sînore Îrana wê demê ber bi desthilata Osmanî koç dikin û bi demê ra li cografyayeke berbifreh belav dibin. Herçend şêxbizinîyên li Îraqê ji aliyê zimanî ve di nav kurdîya soranî da bihelin jî li Tirkîyeyê di asta axaftinê da dikarin şêwezarê xwe biparêzin. Armanca me ji vê gotarê ew e ku em taybetmendîyên cîyaker ên şêxbizinî rave bikin û cihê wê di nav zar û şêwezarên kurdî yên din da destnîşan bikin. Ji ber vê em bêhtir li ser taybetmendîyên cîyaker ên şêxbizinî zûr dibin û wê bi zarên din ên kurdî ra berawird dikin. Piştî nirxandinên li ser deng, teşenasî û ristesazîya şêxbizinî em digihîjin wê encamê ku şêxbizinî şaxeke zarên kurdîya başûrî ye ku bi demê ra karîgerîya kurmancî li ser çê bûye.

Peyvên Sereke

Şêxbizinî, Kurdî, Şêwezar, Zarê başûrî.

Abstract

Sheikhbizinîsh is a third variety of Kurdish spoken in Turkey, a subdialect of Southern Kurdish, after Kurmanji and Zazaki. The Sheikhbizini tribe, who speak this subdialect, migrated from the borders of Iran to the areas where the Ottomans ruled as a result of the Ottoman Safavid conflict in the 16th century and spread over a wide geography. Although the Sheikhbizini in Iraq have merged into Sorani Kurdish as a dialect, they have managed to continue their dialect at a spoken level in Turkey. With this article, we aim to explain the distinctive features of Sheikhbizinîsh and to determine its place among other dialects and subdialects of Kurdish. Therefore, we focus more on the differences of Sheikhbizinîsh and try to compare it with other dialects of Kurdish. When we consider the phonetic, morphological and syntactic features of Sheikhbizinîsh, we reach the conclusion that Sheikhbizinîsh is a branch of the southern dialect of Kurdish but has gradually come under the influence of Kurmanji.

Keywords

Sheikhbizinîsh, Kurdish, Subdialect, Southern dialect.

Destpêk

Ji M. Garzonî û vir ve bi mebestên cîyawaz gelek kurdnasên bîyanî li ser şaxên cîyawaz ên zimanê kurdî nivîsîne û her yekî ji wan zarek yan binzarekî kurdî ji bo xebatên xwe kirîye binema. Herçend di mînaka Fossumî da hin ji van vekoleran behsa hebûna zarên kurdî kiribin (Yıldız, 2023, r. 27-28) û di mînaka E. Soaneyî da berê xwe dabîn hin ceribandînan berawirdkarîyê jî (Kurdo, 2021, r. 24-25) bi awayekî rêkûpêk berawirdkirina van zaran nebûye beşek ji xebatên wan. Loma jî heta sedsala 20em li ser vê mijarê xebatên giring nehatine kirin. Em dikarin bibêjin ku çend kurdnasên bîyanî yên mîna D. N. Mackenzieyî ne tê da, ev xebat bi geşbûna bizavên neteweyî û hewldanên plandana zimanî ra bi piranî ji alîyê zimannasên kurd ve hatine kirin.

Di vê çarçoveyê da Celadet Bedirxan di 1932yê da bi mebestên neteweyî ji bo nîşandana hêza derbirîna zimanî, pakkirina kurdî ji bêjeyên bîyanî û çêkirina zimanekî hevbeş berawirdkirina zarên kurdî yek ji karên pêwîst û giring dide zanîn û vê yekê di nav armancên xwe yên sereke da destnîşan dike (Hawar, 1932, r. 1-2). Ev armanc ji alîyê wî ve neyên cihbichkirin jî Qanatê Kurdo di vî warî da pêngavên kirdeyî diavêje û kurmancî û soranî wek du zarên kurdî yên edebî berawird dike. Li ser vê bingehe jî nivê duyem ê sedsala 20em heta îro di navbera zarên kurdî yên sereke da gelek xebatên berawirdkarîyê tên kirin û di vî warî da lîteratureke baş çê dibe. Tevî vê raborîyê di qada berawirdkirin û nasandina zar û şêwezarên kurdî da gelek warên xam hene ku bi awayekî pêwîst kar li ser wan nehatîye kirin.

Bi dîtina me şêwezarê şêxbizinîyên li Tirkîyeyê jî yek ji van qadan e ku bi başî nehatîye vekolîn. Ji bilî nebûna xebatên zanistî, di çarçoveya çanda giştî da jî şêxbizinî û şêwezarê wan baş nayên nasîn û li Tirkîyeyê dema ku behsa zar û şêwezarên kurdî tê kirin şêxbizinî qet nayê bîra mirovan û ev binzarê kurdî tê paşguhastin. Herçend di sedsala 19em da Hacı Qadirê Koyî (1816-1897) bi malika xwe ya “Şêxbizeynî qisey wekû Caf e / Xo keramet nîye emîş laf e” (1390, r. 209) bal kişandibe ser vê babetê jî mixabin mîna gelek karên giring ev kar jî bi derengî dikeve rojeva kurdan. Li gor zanyariyên me ji nav kurdên bakurî cara pêşî Mehmûd Lewendî di 1997ê da di du hejmarên kovara *Bîrnebûnê* da bal dikêşe ser vê mijarê û behsa hin cîyawazîyên dengî yên şêxbizinî dike û hin risteyên vî şêwezarî di gel kurmancî berawird dike.

Ji ber dagirtina vê kêmasîyê û balkişandina ser vê mijara giring bi arîkarîya kurdekî şêxbizinî me dest bi xebateke weha kir. Lê berî ku em taybetmendîyên zimanî yên şêxbizinîyan destnîşan bikin em dê di vê xebatê da pêşî ji bo nasandina şêxbizinîyan behsa raborîya wan û warên niştecihbûna wan bikin. Li ser vê bingeha dîrokî û sosyolojîk jî em dê berê xwe bidin şayesandina taybetmendîyên dengî (fonetîk), teşenasî (morfolojîk) û ristesazîyê (sentaktîk) yên şêxbizinî. Hêjayê gotinê ye ku ev xebat ji monografiya zimanî ya şêxbizinî bêhtir berawirdkirina wê ye di gel zarên kurdî yên din. Bi vî awayî em dixwazin cihê vî şêwezarî di nav zimanê kurdî da destnîşan bikin. Ji ber vê em di vê xebatê da bi piranî li ser taybetmendîyên xweser ên vî

şêwezarî zûr dibin û taybetmendîyên wê yên hevbeş di gel zarên kurdî yên din zêde behs nakin. Agahî û daneyên zimanî yên vê xebatê ji nav şêxbizinîyên Haymanayê û ji deverên din ên Tirkîyeyê hatine tomarkirin û nivîskarê duyem ê vê gotarê jî wek şêxbizinîyekî bûye çavkanîyeke van agahîyan.

1. Mîtosa Navê Şêxbizinîyan û Warên Niştecihbûna Wan

Diyarkirina reh û destpêka hoz (eşîret) û etnîsîteyan karekî kêşedar e. Ji ber vê gelek caran rastî û efsane tevlihev dibin. Li ser reha şêxbizinîyan, peydabûna navê wan û belavbûna wan jî em rastî heman dîyardeyê tên. Vekolerên ku li ser şêxbizinîyan kar kirîye, jêdera vî navî bi çendîn mîtosên nav gelî ve girê didin ku di navenda hemûyan da şêxekî karîzmatîk, kerametên wî yên balkêş û cerdeyên rêbir hene. Li gor van ragihandinên ku ji nav şêxbizinîyan hatine tomarkirin, jêdera navê “şêxbizinî” xwe dispêre çend çavkanîyên cîyawaz ên zimanî, cihî û çîrokî.

Li gor vê, di çar ragihandinan da jêdera navê şêxbizinî bi navê cihan ve tê girêdan. Li gor ragihandina yekem li navçeya Pêncwînê li gundê Bizênyanê şêxekî navdar hebûye û ji ber ku xelk zêde hatine serdana wî û pîrsa wî hatiye kirin navê “şêxbizênî” peyda bûye. Di ragihandina duyem da jêdera vî navî bi Bazîyanê ve tê girêdan û ji ber navdarîya şêxê vir navê “şêxî bazîyanî” li ser zimanê xelkî veguherîye û bûye “şêxbizênî”. Di ragihandina sêyem da şêxek bi hoza xwe ve li derûdora Zêya Mezin û Biçûk niştecih dibin û li giravekî dijîn. Li vê giravê av dibe du şet ku di şêwezarê şêxbizinî da ji vê ra “du biz” tê gotin. Ji ber başîya vî şêxî xelk tê serdana wî û jê ra dibêjin “şêxî bizên” (Şêxbizênî, 2015, r. 39-40). Di ragihandina çarem da jî ev hoz navê xwe ji Kuhê Bizeynî werdigire ku navê çîyayekî rojavayê Kirmanşahê ye (Gökpınar-Geliş, 2016, r. 382).

Li hember vê jêdera cihî, di sê ragihandinan da jêdera vî navî bi ajela “bizin”ê ve tê girêdan. Li gor vê di ragihandina yekem da cerde diavêjin ser mal û milkê şêxî û di gel kelûpelên din bizineke wî ya qîmetdar jî dibin ku salê du caran dizê û her carê jî sê karan tîne. Li ser vê şêx guman dibe ser yekî û doza bizina xwe lê dike. Tevî ku zîlam bizinê ser jê jî kirîye bi duaya şêxî hemû perçeyên bizinê tên ba hev û bizin zindî dibe. Di ragihandina duyem da bizinên şêxî ew çend zêde ne ku çêre têra wan nake û ji ber vê mirov diçin gilîya wî bi Mîrê Botanê dikin. Tevî wergirtina hin tedbîran dîsa jî bizinên wî zêde dibin û ji ber vê zêdebûna bizinên wî jî ev nav lê tê danîn. Di ragihandina sêyem da şêx cureyê bizinên “flik”ê tîne welatî ku ji alîyê xelkê herêmê ve nayê nasîn û ji ber vê çendê ev nav lê tê danîn (Şêxbizênî, 2015, r. 40-42).

Ji alîyê jêdera zimanî ve jî di çar ragihandinan ev nav bi gotinên kurdî, di sê ragihandinan da bi gotinên farisî û di sisêyên din da jî bi gotinên erebî ve tê girêdan. Ji nav ragihandinên kurdî li gor ragihandina pêşî ji ber ku xelkê navçeyê bi zanatîya şêxî gelek bawer in û gelek caran jê ra dibêjin “şêx bizanê” ev nav peyda dibe. Lê di du ragihandinan da ev nav bi “bezên”a kurdî ve tê girêdan. Lewra şêx hertim reqîbên xwe bi zanîn û qehremanîya xwe “dibezîne” yanî wan têk dibe û ji ber vê jî ev nav lê tê danîn (Şêxbizênî, 2015, r. 43). Di ragihandina çarem da jî dema ku cerde diavêjin

ser mal û tekyaya wî, şêx gopalê xwe li erdê dixê û bi qîrîn dibêje “bizên bizên û ji axê derkevin”. Li ser vê ji bin axê bi milyonan moz derdikevin, êrîşî cerdevanan dikin û cerdevan jî malên ku dizîne dihêlin û direvin. Ji ber vê rûdanê jî navê “şêxbizînî” lê tê danîn û ev nav paşê dibe navê hozekê (Bozkurt, 2021, r. 227-228).

Li hember van ragihandnên kurdî di sê ragihandinan da navê “şêxbizînî” bi bêjeya “şêx bizen” a (şêx lê bide) farisî ve tê girêdan. Lewra dema ku cerde divavêjin ser wan, murîdên şêx wî bi vê gotina farisî han didin û ew jî bi kerametên xwe li cerdeyan dide û ji wan rizgar dibin. Herî dawî di sê ragihandinan da jî jêdera vî navî bi gotineke erebî ve tê girêdan ku ji ber karîgerîya şêxî, murîdên wî yên ereb jê ra dibêjin “şêx zîn” yan jî “şêx’ul bizunîne” û ev gotina ku tê manaya “şêxê çak û baş” li ser zimanê xelkî vediguhere “şêxbizînî” û paşê jî dibe navê vê hozê (Şêxbizênî, 2015, r. 38-42).

Herwek jêdera navên şêxbizînîyan li ser welatê resen ê şêxbizînîyan jî boçûnên cîyawaz hene. Mehmet Fîgan Bazîyana Silêmanîyê welatê resen ê wan dizane û dîyar dike ku berî hatina Îslamê ji ber sedemeke nedîyar şêxbizînîyên ku wê demê navê wan “ebnayî” ne diçin li Yemenê bi cih dibin. Li vir Şêx Bazan walîtîya Sasanîyan dike û piştî hatina îslamê vî dînê nû qebûl dikin (Fîgan, 2022, r. 445). Li hember vê beşeke zêde ya vekoleran jî bingeha vê hozê, Kurdistanê Îranê dizanin. M. Se’d Faruq Yusif Şêxbizênî, di xebata xwe ya *Hozî Şêxbizênî* da warê resen ê vê hozê Qesrê Şîrîn (2015, r. 18) û Gökpinar û Geliş jî Çîyayê Bizeynîyê yê Kirmanşahê didin zanîn (2016, r. 395). Em dikarin bibêjin ku taybetmendîyên zimanî yên şêxbizînîyan vê ragihandinê piştrast dikin, lewra daneyên zimanî yên şêxbizînîyan nîşan didin ku ev şêwezar şaxeke kurdîya başûrî ye û warê wan ê resen jî di nav sînorê niha yê Îranê da ye.

Ji ber milmilaneya di navbera Osmanî û Sefewîyan da di sedsala 16em da jîngeha şêxbizînîyan diguhere û warên jîyana wan berfirehtir dibin. Ji ber vê Şerefxanê Bedlîsî dema ku navê hozên Botanê tomar dike cih dide hoza şêxbizênî (2007, r. 212). Ev jî nîşan dide ku piştî şerê Çaldiranê şêxbizînî ji welatê xwe yê resen derdikevin û li gelek herêm û welatan belav dibin. Di vê çarçoveyê da beşek ji wan ber bi deverên Botan, Dîyarbekir, Urfa û Erzeromê ve koç dikin, beşek li herêma Behdînanê bi cih dibin û beşek jî li derûdora Kerkûkê bi cih dibin.

Ji çavkanîyên Osmanî dîyar dibe ku şêxbizînî gelek caran li dijî desthilata Osmanî serî hildidin, baca xwe nadin û Osmanî jî bi mebesta şikandina hêza wan û rêgirtina serhildanên wan dem bi dem wan li cihên cîyawaz belav dikin (Bozkurt, 2021, r. 225-226). Ji ber vê ev hoz demeke dirêj li van deran bi koçerî dijîn. Her sê fermanên di destê şêxbizînîyan da nîşan didin ku ev hoz di salên 1756, 1780 û di 1815ê da ber bi Anadolê ve tîr veguhestin (Fîgan, 2022, r. 454). Georges Perrotê ku di 1860ê diçe Haymanayê dîyar dike ku kurdên li vir dora duwazdeh yan jî pazdeh sal berê hatine vir (2021, r. 93). Piştî demekê jî beşek ji vê hozê ji Haymanayê jî koç dikin û li Akyazi, Duzce, Boyabat û Merzîfonê niştecîh dibin (Yurtdaş, 2018, r. 38).

Ji ber vê cihguhertinê û bi mebesta ku li cihên xwe yên nû prestîjekê bi dest bixin mîna hin hozên din ên kurdan hinek şêxbizînî xwe dispêrin Ebasîyan (Bozkurt, 2021,

r. 227), beşek ji wan bi palpiştîya hin belgenameyên dîrokî (Türkay, 2012, r. 358) di çarçoveya mîstîfîkasyona nasnameyî da xwe seyîd didin zanîn (Yurtdaş, 2018, r. 38) û beşeke biçûk jî xwe bi tirkbûnê ve girê didin (Gökpınar-Geliş, 2016, r. 431). Bêguman hemû ev îdîa ji rastîyê dûr in û sedema sereke ya vê yekê ew e ku wek komeke etnîk gava ku tên koçberkirin ji bo ku xwe li wargehên xwe yên nû bidin qebûlkirin ji hêza van nasnameyên biprestîj sûd werdigirin ku xwedî avantajên civakî û aborî bûn.

Tevger û koçberîya şêxbizîniyan dibe sedem ku ev hoz li herêmeke berfireh belav bibe û endamên wan li çendîn welatan niştecîh bibin. Loma jî şêxbizîni li Îraqê li bajar û bajarokên Bexdad, Xaneqîn, Kerkûk, Silêmanî, Çemçemal, Pirdê, Axca, Koye, Teqteq, Şuvan, Keleşî Yasîn Axa, Hewlêr, Amedî, Duhok û Mûsilê, li Sûrîyeyê li bajarên Şam, Heleb û Reqayê, li Îranê jî li bajarên Sine, Mehabad Xuremabad, Şîraz, Kazron û Kirmanşahê bicihûwar dibin (Şêxbizîni, 2015, r. 128-321; Gökpınar-Geliş, 2016, r. 92; Yurtdaş, 2018, r. 38-39; Bozkurt, 2021, r. 226-229).

Ji bilî van welatan li Tirkîyeyê jî ev hoz bi tîra xwe belav dibe. Di raporeke fermî ya Osmanî da ku di navbera 1913 û 1918ê da ji bo karbidestên dewletê hatîye amadekirin li wîlayeta Erzeromê li sê cihan navên şêxbizîniyan derbaz dibe. Li hember navê “Şeyh Bîzîtîn”ê tê dîyarkirin ku li Narmana navenda Erzeromê 417 kes ji vê hozê dijîn, li hember navê “Şeyh Bîzunlî”yê hatîye ku li Îspîr, Tortum, Keskîm û Bayburta ser bi Erzeromê 200 kes hene û herî dawî bi navê “Şeyhzenlî”yê li Bayburtê wek 1150 kes tên tomarkirin (2021, r. 158-159). Di çavkanîyeke din da jî di bin navên “Şeyhbizîni, Şeyhbizînlî û Şeyhbuzûnlî”yê da cihên niştecîhbûna vê hozê wek Kutahya, Îskilîb, Palu, Geyve, Haymana, Mêrdîn, Rakka, Ankara, Dîyarbekir, Erzerom, Kastamonu, Kengirî, Bozok, Çildir, Karaman tê destnîşankirin (Türkay, 2012, r. 135).

Di serdema Komara Tirkîyeyê da cihên şêxbizîniyan berfirehtir dibe û vekolerên dîyar dikin ku îro şêxbizîni li gelek bajar û deverên cûrbicûr ên Tirkîyeyê dijîn. Li gor tespîtên wan li bajarên Dîyarbekir, Cizîr, Urfa, Semsûr, Erzerom, Qers, Îdir, Wan, Sakarya, Karabuk, Samsun (Bafra), Sînop, Trabzon, Bayburt, Gumuşhane, Artvîn, Duzce, İzmir Çorum, Çankiri, Kastamonu, Amasya (Merzîfon), Kirşehîr, Kutahya, Tokat, Yozgat, Karaman, Ankara Konya û Adanayê hin gund û malbatên şêxbizîniyan hene (Lewendî, 1997, r. 81; Özkök, 1998, r. 16-17; Yurtdaş, 2018, r. 38-39; Bozkurt, 2021, r. 230). Lê di nav van cihan da navenda wan a herî giring Haymanaya Ankarayê ye ku li vê derê li dora sih gundan niştecîh in û navenda wan jî nahîyeya Yeniceyê ye (Bozkurt, 2021, r. 229).

2. Taybetmendîyên Dengî yên Şêxbizîni

Dengên şêxbizîni di gel zar û şêwezarên din ên zimanê kurdî hevbeş in. Herçend li gor kurdîya nivîskî ya îro di mînakê her du dîftongên “u-ê” (ö) û “î-y”yê (ü)yê cîyawazîyek bê dîtin jî (Lewendî, 1997, r. 83) ev dîftong di hin binzarên din da jî tên dîtin. Ji ber vê ev cîyawazî ne tenê taybet bi şêxbizîni ne û di binzarên din da jî tên dîtin. Ji vê bêhtir, guherînen dengî yên zimanekî yan jî şêwezarekî di dîyarkirina mal-

bata zimanî yan jî şaxên şêwezarî da guherînên giringtir in û ev rûdanên dengî nîşanî me didin ku ev şêwezar ser bi kîjan malbat yan şaxa zimanî ne. Ji bo diyarkirina cihê şêxbizinî di nav zimanê kurdî da em dê guherînên dengî yên vî şêwezarî berbiçav bikin ku hem cihê vî şêwezarî destnîşan dikin hem jî hevterîbê taybetmendîyên giştî yên guherînên dengî yên zimanê kurdî ne.

2.1. Guherîna dengnedêran

b→w, v: Dengên “b”yê yên kurmançî û soranî bi giştî di şêxbizinî da herwek şêwezarên din ên başûrî vediguherin “w, v”yê. Ev guherîn di goranî û zazakî da jî tên dîtîn ku meyla giştî ya şêwezarên başûrî ye (bnr: Malmîsanij, 2013).

Mînak: ba: va, brûsk: virîske, baran: varîş, barîn: varîn, bi: wi...

l→r: Ev guherîna dengî mîna zarên din, di şêxbizinî da jî tê dîtîn. Loma jî li gor deverên cîyawaz bêjeyên ku dengên “l” û “r”yê di wan da hene bi hev diguherin. Bo nimûne di mînaka “bila/bira”yê da şêxbizinî li gor devera xwe carinan “bila”yê û carinan jî “bira”yê bi kar tînin ku heman cîyawazî di kurmançî da jî tê dîtîn.

r→l: Berevajî guherîna “l”yê bi “r”yê, carinan dengê “r”yê jî bi “l”yê diguhere. Ev guherîn kêmtir tê dîtîn. Bo nimûne di nav şêxbizinîyên Sakarya, Duzce û Paşakongîyê da (Havza/Samsun) di hin mînakan da “r” dibin “l”. Loma jî li van deran “ra” (ji bo) dibe “la” û “raçe” (çima) dibe “laçe”.

-Dîştî eye lam (ram) wîn (Dibêje wî ji min ra bibîne) (Hamza Aksoy, 2024).

-La mangî rûjig a wigirim (Ji bo mehekê dê rojî bigirim) (Mehmet Öksüz, 2024).

d→r: Di hin mînakan da “d”yên ku di eslê bêjeyê da hene bi “r”yê diguherin. Ev guherîna dengî di zarên kurdî yên din da jî tê dîtîn. Bo nimûne di kurmançî da bêjeya “didan”ê li hin deveran bi “diran”ê diguhere.

-Hedîye diran we yek (Hedîye didan hev) (Hacı Murat Keskin, 2023).

-Şivanê xase ke hat we mal, vîri xwêyan dirin wê (Şivanê baş ku hat malê, berê xwe didinê) (Tayyar Üstün, 2020).

Ev guherîn di nav şêxbizinîyên Haymana, Konya, Duzce û Sakaryayê da jî tê dîtîn lê ji bilî çend bêjeyan ev ne guherîneke giştgir e. Ji bo vê em dikarin mînakên kûdî: kurî (kunder) û odag: orag (zarok)ê bidin.

d→y: Ev guherîn di nav şêxbizinîyên Deryaya Reş da (Amasya, Sînop, Kastamonu) tê dîtîn û li van deran guherîneke cihgirtî ye. Ji bo vê em dikarin van mînakan bidin: “de: ye, adîna: ayîna (înê), sed: sey, Ehmed: Ehmey, Mihemed: Mihemey, dixwerim: yixwerim.

g→x: Hin bêjeyên ku di eslê wan da dengên “g”yê hene bi “x”yê diguherin. Ev guherîn di nav hemû şêxbizinîyan da tê dîtîn û di mînaka gireya pirhejmarîyê (-gel) da gelek berbiçav e.

Mînak: tîşig: tîşix, qawgel: qawxel, ustagel: ustaxel...

j→c: Ev guherîn di nav hemû şêxbizinîyan da tê dîtîn û her du awayên van dengan jî tên bikaranîn. Ev yek, bi taybetî di mînaka bêjeya “verjê: vercê” (berê) da gelek

dîyar e. Di vê çarçoveyê da gihaneka “jî”yê di nav şêxbiziniyên Duzce û Sakaryayê da bi awayekî mayînde vediguhere û dibe “cî”. Guherîna “j-c”yê di goranî, zazakî û şêwezarên din ên başûrî da jî dîyardeyeke berbiçav a dengî ye (bnr: Malmîsanîj, 2013).

-Dari tu cî onnayn (Me dara tuyê jî danî) (Burhan Özçelik, 2025).

ç→t: Ev guherîn di hin bêjeyên kurmançî da jî tê dîtin. Bo nimûne hokera “çi/çu”yê li hin deverên kurmançî vediguhere û dibe “tu”. Em heman guherînê di şêxbiziniyê da jî dibînin. Bo nimûne “çisan” ku ji “çi+zan”ê pêk hatiye, bi guherîna dengî bûye “ti+san” û “tu+san”.

-Tu adem tusanê (Tu zilamtîyê çi dizanî!).

Heman guherîn di bêjeyên “çaşîyan: taşîyan” (hînbûn), “çaşandin: taşandin” (hînkirin)ê da jî tê dîtin.

-Rejberîye je tu taşîyam (Rêncberîyê ji te hîn bûm) (Cemal Şadan, 2024).

2.2. Guherîna dengdêran

ê→î: Ev guherîn bê cîyawazî di nav hemû şêxbiziniyan da tê dîtin û guherîneke cihgir e. Ji bo vê mirov dikare mînakên “dê: dî”yê (gund) bide.

i, e→î: Piştî dengên “i” û “e”yê dema ku kîteyeke bi “ê”yê diqede bê bikaranîn, di bin karîgerîya dengê “ê”yê da “i” û “e” vediguherin “î”yê. Ev guherîna dengî li gor devera ku çê dibe guherîneke mayînde çê dike.

Mînak: xalikê: xalîkê, sûzandigê: sûzandîyê...

2.3. Ketin û Guherîna Dengan

Ketina dengê “w”yê û guherîna “e→a”yê: Li hin gundên Haymanayê bêjeyên ku bi dengnedêrên “xw”yê dest pê dikin û piştî wan “e” tê bikaranîn “w”ya wan dikeve. Di vê rewşê da “e” bi “a”yê diguhere. Ji ber vê hem ketin hem jî guherîna dengî çê dibe. Heman taybetmendî di kurmançîya devera Wanê da jî tê dîtin. Ji ber vê di şêxbiziniyê da xwer (roj) dibe xar, xweş dibe xaş û xwesî dibe xaşî.

-Je min feqîr çe **dixazê** (dixwezê)? (Feqîr ji min çi dixwaze?)

-Dimîne we **xarî** (xwer) axistos. (Dimîne tava teboxê) (Dogan, 2007).

Ketina dengê “w”yê û guherîna “i→u”yê: Celadet Bedirxan dengê “u”yê dengekî nû dide zanîn ku ji kelijîna her du dengên “w” û “i”yê pêk hatiye (Ali Bedir Han-Lescot, 2004, r. 11). Bikaranîna van dangan di şêxbiziniyê da vê raya wî rast didêre, lewra di nav şêxbiziniyan da her du awayên “w+i”yê û “u”yê bi hev tînin bikaranîn.

Mînak: **kwird:** kurd, **kwire:** kure (kur), **gwil:** gul, **kwil:** kul, **kwilîyan:** kulîyan (kelîyan)...

Lê balkêş e ku ne tenê bêjeyên kurdî, bêjeyên ku ji erebî jî hatine wergirtin bi rêya analojîyê bi heman awayî tînin bikaranîn. Lê di van bêjeyan da guherîneke berevajî çê dibe û “u” bi “w+i”yê tê guhertin:

Mînak: **dunya:** dwinya, **qurban:** qwirban...

Ketina dengê “w”yê û guherîna “e→o”yê: Ev guherîn di mînaka paşdaçeka “ew”ê da derdikeve pêş û gava ku “w” dikeve “e” bi “o”yê diguhere.

-Î gave her yekê vilav **o** (ew) wî, her yekê layk **o** (ew) çîgin (Vê gavê her yek li cihekî belav bûye, her yek çûye alîyekî) (Cömert, 2023).

Ketina dengê “e”yê: Di hemû zar û şêwezarên kurdî da gava ku dengdêrên kurt û dirêj tên cem hev di bilêvkirinê da dengên kurt dikevin. Ji vî alîyî ve ketina dengê “e”yê gelek tîpîk e. Herwek soranî di şêxbizînî da jî gava ku pêşdaçek û hin cihnavên ku bi dengdêrên dirêj dest pê dikin, pêkve tên nivîsîn, “e” dikeve û pêşdaçek û cihnav dibin yek bêje.

Mînak: le + îre: lîre (li vir), le + ûre: lûre (li wir), je + îre: jîre (ji vir), je + ûre: jûre (ji wir), de + îre: dîre (di vir da), de + ûre: dûre (di wir da)...

2.4. Cihguherîna Dengan (Metatez)

Cihguhertina dangan li hin gundên şêxbizînîyan di gihaneka “jî”yê û pêşdaçeka “le”yê da tê dîtin. Guherîna “jî”yê bi “îj”ê bi giştî di nav şêxbizînîyên Sînop, Kastamonu, Samsun û Amasyayê da dîyardeyeke berbelav e. Ev guherîn di zarê soranî da bi awayê “îş”ê bi tevahî cih girtiye û awayê “jî”yê hatiye jibîrkirin. Bi heman awayî di nav hemû şêxbizînîyan da nebe jî di nav şêxbizînîyên gundên Atakoya Haymanayê û Kamsîliya Merzîfonê da daçeka “le”yê bi “el”ê tê guhertin.

-Min **îj** xeftim (Ez jî raketim) (Muhammed Ali Camcı, 2024).

-Tuj (tu îj) boro (Tu jî here) (Sami Yatmaz, 2024).

-Atakoy **el** her tereffî hest. (Atakoyî li her cihî hene) (Cömert, 2023).

3. Taybetmendîyên Teşenasîyê yên Şêxbizînî

3.1. Pirhejmarîya Navdêran

Pirhejmarîya navdêran ji bo ji hev cudakirina zarên kurdî pîvaneke giring e. Ji bo pirhejmarîyê di kurmançî da tenê “-an”, di soranî û goranî da bi piranî “-an” û kêman “-gel”, di zazakî da “-an” û “-î” û di şêwezarên başûrî da jî “-gel” (-yel/-el) tên bikaranîn. Di vê çarçoveyê da di şêxbizînî da jî wek şaxeke şêwezarên başûrî ji bo pirhejmarîya navdêran “-gel” tê bikaranîn ku li gor rewşa fonetîk a bêjeyan carinan vediguhere formên “-yel, -el”ê jî.

Mînak: dar → dargel, çêw (çav) → çêwgel...

Eger navdêr bi dengên “g, k, q, x”yê biqedin ji bo sivikkirinê “g”ya paşgira “-gel”ê tê xistin û gireya pirhejmarîyê tenê “-el” dimîne. Herweha ku dawîya bêjeyê bi dengdêrekê biqede dîsa ji bo sivikkirinê “g” dikeve lê vê carê wek dengê arîkar “y” di navbera her du dengdêran da tê bikaranîn û paşgira “-yel”ê peyda dibe.

Mînak: seg → segel, dendik → dendikel, zilq (silq) → zilqel, mix (mîx) → mixel, kênî (kanî) → kênîyel, mûrî → mûrîyel...

Paşgira “-an”ê ku di zarên din da paşgira sereke ya pirhejmarîyê ye, di şêxbizînî da tenê di gel hejmaran tê bikaranîn û cihê wan navdêran digire ku rengdêrên hejmarî berî wan tên bikaranîn.

-Min ijnardigimê, şêst gûrra we. (Min ew hejmartin, şêst gore ne)

-Min ijnardigimê, şêstan e. (Min hejmartin, şêst in)

-Je dare şeş girdekan xistim. (Min ji darê şeş gûz xistin)

-Je dare şeşan xistim. (Min ji darê şeş xistin)

3.2. Nenasyarî û Nasyarîya Navdêran

Mijara nenasyarîyê kêr zêde di hemû zar û şêwezarên kurdî da mîna hev e û tenê ji aliyê dengî ve di navbera wan da cîyawazî çê dibin. Gireya nenasyarîyê di kurdî da bi giştî wek “-ek”ê derdikeve pêşîya me. Di hin devokên zazakî yên mîna Liceyê da “êk” bê bikaranîn jî di nav piranîya devokên zazakî da “k” tê xistin û ji bo vê rewşê tenê “(y)ê” tê bikaranîn (Yıldız, 2025, r. 115). Berevajî zazakî herçend di binzarê Silêmanîyê da “k” ketibe jî ev gire bi giştî di soranî da wek “-êk”ê cihê xwe girtiye. Mîna zazakî û binzarê silêmanî ev gire di goranî da jî bi giştî wek “-(y)ê”yê tê bikaranîn lê car bi car di formên “êk”, “êw/êwe”yê da jî derdikeve pêşîya me (Yusupova, 2017, r. 15).

Heman rewş di şêxbizînî da jî tê dîtin û ev gire hem bi awayê “-îk”ê hem jî bi awayê “-î”yê tê bikaranîn. Lê weha xuya dike ku bi demê ra di navbera van her du awayan da hûrgilîyeke bikaranînê çê bûye. Loma jî halê hazir di şêxbizînî da eger piştî navdêrê gireyeke din yan jî veqetandek neyê bikaranîn ji bo nenasyarîyê “-î” tê bikaranîn lê eger piştî wê gireyek yan veqetandek bê bikaranîn wek “-îk”ê tê bikaranîn.

-Kêrdî dîm. (Min kêrek dît)

-Kêrdîkit dîm. (kêrd+îk+it) (Min kêreke te dît)

-Kêrdîki tu dîm. (Min kêreke te dît)

Li hember hevterîbîya nenasyarîya navdêran, ji aliyê nasyarîyê ve di navbera zar û şêwezarên kurdî da cîyawazî tên dîtin. Di zarên bakurî yên mîna kurmançî û zazakî da zayend û tewang hene lê di zarên navîn û başûrî da li şûna van her du pergala, nasyarîya navdêran tê dîtin. Nasyarîya navdêran taybetmendîyeke kevin a zimanê kurdî be jî bi demê ra ev taybetmendî di zarên bakurî da wînda dibe û tenê li hin cihan bi awayekî fosîlîzebûyî dimîne. Ji ber vê di kurmançîya Behdînan û Hekaryayê da di cihnav û rengdêrên nîşaneyê da paşgira nasyarîyê “-e” herwekî “eve, ewe, ev mirove, ew mirove”yê tê bikaranîn û di kurmançîya bakurî û rojavayî da jî bi paşgira “-a”yê herwekî “eva, ewa, ev mirova, ew mirova”yê tê bikaranîn. Herçî zarên soranî û goranî ne di cihnav û rengdêran da herwek kurmançîya Behdînan û Hekaryayê tên bikaranîn lê ji bo nasyarîya navdêran dengê “k”yê tê berî “-e”yê û di forma “-(e)ke”yê da piştî navên nasyarîyê tê bikaranîn (Yusupova, 2017, r. 15).

Nasyarî li ser rêçika şêwezarên başûrî yên mîna feylî di şêxbizînî da jî ji bilî çend awarteyên navdêran hem ji bo cihnav û rengdêrên nîşaneyê hem jî ji bo navdêran bi yek awayî û bi paşgira “-e”yê tê çêkirin. Ji vî aliyê ve ji aliyê bikarnenaîna “-eke”yê ve jî soranî û goranî cuda dibe û bi awayê hev girtî li her cihî bi heman awayî tê bikaranîn.

Mînakên navdêran: Mêrike, we dwête jî dîşî: Diwû, da rat wê wîşim (Zilam, ji keçikê ra dibêje: Dibe, ez dê ji bo te bibêjim) (Özgür, 2024).

Mînakên cihnavên nîşaneyê: Eye (ev/eve) ewe (ew/ewe)

Mînakên rengdêrên nîşaneyê: Ey însane (ev mirov/ ev mirove), ew/o însane (ew mirov/ ew mirove)

Lê di du rewşan da awarteya vê qayîdeya giştî çê dibe. Awarteya yekem ew e ku navdêrên ku dawîya wan bi dengê “a”yê diqedin “e”yê wernagirin û navdêrên ku bi “e”yê jî diqedin dema ku “-e”ya nasyarîyê werdigirin her du “e” bi “a”yê diguherin. Hêjayê gotinê ye di mînakên cihnav û rengdêrên nîşaneyê da di kurmancîya bakurî û rojavayî da li şûna “e”ya nasyarîyê bi awayekî sistematîk “a” cih digire.

-Manga aw dixwerî. (Manga avê vedixwe)

-Qe kuna nêgirê? (Qey kunê digirî?) (Eslê bêjeyê kune ye lê ji bo nasyarîyê bûye kuna)

3.3. Cîyawazîyên Rengdêran

Rengdêrên çawanîyê di şêxbizînî da xwedî taybetmendîyeke xweser in, lewra mîna navdêran di rengdêrên çawanîyê da jî awayê giştî û awayê nasyar ê rengdêrên çawanîyê hene. Ev taybetmendî herwek ravekên navdêrî di ravekên rengdêrî da jî karîgerî li ser veqetandekan çê dikin û dibin sedem ku du cure veqetandek peyda bibin. Rengdêrên çawanîyê dema ku bi awayekî giştî tên bikaranîn navdêr veqetandeka “-i”yê werdigirin û rengdêr jî bi awayekî xwerû tên bikaranîn lê dema ku kes yan tiştê ku tê behskirin dîyar û nasyar bin navdêr veqetandeka “-ê”yê û rengdêr jî gireya nasyarîyê “-e”yê werdigirin.

Mînakên rengdêrên giştî: dwêti rind (keça rind), kerdi tîj (kêra tûj)...

Mînakên rengdêrên nasyar: dwêtê rinde (keça rind), kêrdê tije (kêra tûj)...

Herçend di nav şaxên kurmancî da her du awayên xwerû û nasyar ên rengdêrên nîşaneyê hebin jî di şêxbizînî da herwek soranî tenê forma nasyar a rengdêrên nîşaneyê heye. Lê hêjayê behskirinê ye, ji bo rengdêra nîşaneyê ya nêzîk guherteyên “ay/ey/i”yê (ev) û ji bo rengdêra nîşaneyê ya dûr jî “ew/o” tên bikaranîn.

-Ay awe şillû we. (Ev av şêlû ye)

-Ey kîtawe kîtawê min e. (Ev kitêb kitêba min e)

-Î qapiye swêr e. (Ev derî sor e)

-Ew xanige dwîr e. (Ew xanî dûr e)

-O kîtawe kîtawê min e. (Ew kitêb kitêba min e)

Rengdêrên hejmarên rêzekî ji ber dîyarbûna hejmara wan, hertim di forma nasyar da tên bikaranîn lê di vir da du pergala hene: Di pergala yekem da piştî hejmara rêzekî tenê “-e”ya nasyarîyê tê bikaranîn lê di pergala duyem da herwek kurmancîya bakurî û rojavayî ji bo nîşandana rêza hejmarnavan paşgira “an”ê tê ser hejmarnavê û piştî wê jî “-e”ya nasyarîyê tê bikaranîn.

-Le qatê pence dinîşîn. (Em di qatê pêncê/pêncan/pêncem da rûdinin)

-Le qatê pencane dinîşîn. (pênc+an+e)

-Mêrikê çare bila way. (Mêrikê çarê/çaran/çarem bila bê)

-Mêrikê çarane bila way. (çar+an+e)

Rengdêrên dabeşker jî di şêxbizîni da xwedî cîyawazîyeke berbiçav in ku ev yek, di şêwezarên kurdî yên din da li ber çavan nakeve. Di vê pergale da hejmara “yek”ê tê pêşîya hejmara sereke û manaya dabeşkerîyê dide vê hejmarê. Divê em bizanin ku bêjeya “yek”ê di soranî û şêwezarên başûrî da beramberî “hev”a kurmancî ye û manaya hevbeşîyê dide bêjeya piştî xwe. Di vê mînakê da jî “yek” manaya hevbeşîyê dide hejmara piştî xwe û pergaleke taybetî ya rengdêrên dabeşker çê dike.

Mînak: yek sî kêrd (sê sê kêr / bi tirkî: üçer bıçak), yek bîst mê (bîst bîst mih / bi tirkî: yirmişer koyun), yek nwê qelem (neh neh qelem / bi tirkî: dokuzar kalem)...

-Yek du nan xwardîn. (Me du du nan xwarin)

3.4. Cîyawazîyên Cihnavan

Cihnavên kesî yên şêxbizîni bi giştî wek soranî û şêwezarên başûrî ne û bi awayên “min, tu/ti, ewî-ewe, îme, îwe, ewane/wane”yê tên bikaranîn. Lê di forma kesê duyem û sêyem ê yekhejmar da karîgerîya kurmancî li ser wan dîyar e û ev jî yek ji nîşaneyên mobolîzasyona civakî ya şêxbizîniyan e ku ji başûr ber bi bakur ve koçber dibin. Lê balkêş e ku di her du formên kesê sêyem ê yekhejmar da ji hemû zarên din cuda dibe, lewra “ewî”yê ji bo mirovan û “ewe”yê jî ji bo heyberên nemirovî bi kar tînin.

Cihnavên Kesî	1	2	3 (Ji bo mirovan)	3 (Ji bo heyberên nemirovî)
Yekhejmar	min	tu/ti	ewî	Ewe
Pirhejmar	îme	îwe	ewane/wane	

Heman rewşa cihnavên kesî, em di cihnavên likandî da jî dibînin û tevî hin xweserîyên wê şêxbizîni bi giştî nêzî soranî ye lê ji hin alîyan ve di gel kurmancî jî hevbeşîyên wê hene. Ji alîyê xweserîyên wê ve herwek cihnavên kesî di cihnavên likandî da jî kesê duyem û sêyem ê yekhejmar cîyawaz in. Di kesê duyem da li hember “î/ît”a soranî û kurmancî di şêxbizîni da “(y)ê” û di kesê sêyem da jî li gor bikaranîna cihnavê likandî yan qet nayê bikaranîn yan jî di formên “î/y” û “e”yê da derdikevin pêşîya me. Li gor cihê bikaranîna wan em dikarin cihnavên likandî yên şêxbizîni di çar koman da destnîşan bikin:

a) Di demên borî da di gel lêkeran bi awayên “1. -im, 2. -ê, 3. -Ø, 1. -în, 2. -in, 3. -in”ê tên bikaranîn.

Mînak: kirdim/hatim, kirdê/hatê, kird/hat, kirdîn/hatîn/ kirdin/hatin, kirdin/hatin.

b) Di demên niha û bê da eger reha van lêkeran bi tîpên dengnedêr biqedin bi awayên “1. -im, 2. -ê, 3. -î, 1. -în, 2. -in, 3. -in”ê lê dema ku dawîya reha lêkeran bi tîpeke dengdêr biqede bi guherîna dengî ev cihnav bi awayên “1. -m, 2. -y, 3. -y, 1. -în/yn, 2. -in, 3. -in”ê tên bikaranîn.

Mînak ji bo dengnedêran: dikim/dikerim, dikê/dikerê, dikî/dikerî, dikîn/dikerîn, dikin/dikerin, dikin/dikerin.

Mînak ji bo dengdêran: dîyam (têm), dîyay (têyî), dîyay (tê), dîyayn (em tên), dîyan (hûn tên) dîyan (ew tên).

c) Herçî bikaranîna van cihnavan e di gel navdêran, ji bilî kesê sêyem hemû mîna soranî tên bikaranîn û bi awayên “1. -(i)m, 2. -(i)t, 3. -ê, 1. -(i)man, 2. -(i)tan, 3. -êyan”ê derdikevin pêşîya me.

Mînak: dare**m**, daret, darê, dare**man**, daretan, darê**yan**.

d) Cihnavên likandî di kopulayan da jî ji bilî kesê duyem ê yekhejmar mîna kurmançî û soranî ye ku bi awayên “1. -(y/w)im, 2. -(y/w)ê, 3. -(y/w)e, 1. -(y/w)în, 2. -(y/w)in, 3. (y/w)-in”

Mînak: baş **im**, baş **ê**, baş **e**, baş **în**, baş **in**, baş **in**. Kî **yim**, kî **yê**, kî **ye**, kî **yîn**, kî **yin**, kî **yin**. Ça **wim**, ça **wê**, ça **we**, ça **wîn**, ça **win**, ça **win**.

Ji alîyê cihnava xweyî ve jî şêxbizînî herwek soranî ye û “xwê”ya ku beramberî “xwe”ya kurmançî û “xo”ya soranî ye di gel cihnavên likandî bi awayên “xwêm, xwêt, xwê, xwêman, xwêtan, xwêyan”ê tê bikaranîn. Ji alîyê cîyawazîyê ve mîna ku tê dîtîn di şêxbizînî da guherîna dengî ya dengdêran li ber çavan dikeve û di kesê sêyem ê yekhejmar da jî ji ber ku du “ê” li pey hev nayên nîşaneyê kesê sêyem nayê bikaranîn.

3.5. Cîyawazîyên Daçekan

Bikaranîna daçekan di nav şêwezarên kurdî da xaleke guherbar û cîyaker e. Dema ku em hemû şêwezarên kurdî li ber çavan digirin di wan da pêşdaçek, paşdaçek û bazinedaçek hene. Herwek zar û şêwezarên kurdî yên din di şêwezarê şêxbizînî da jî hem bazinedaçek hem jî pêşdaçek tên bikaranîn. Bazinedaçekên şêxbizînî weha ne: “de... ew/o, le... ew/o, je... ew/o, we... ew/o”ê. Pêşdaçekên sereke yên şêxbizînî jî ev in: de (di), le (li), je (ji), we (bi), ra (ji bo), era (çima), raçe (ji ber çî) weki/weke/wekeke (wek), heta/heya, qayşê (qey), siv/sif (tenê), sewi (seba, ji sebeba), werd/gord (di gel).

Herwek tê dîtîn ev pêşdaçek tevî hin guherînên dengî kêm zêde mîna pêşdaçekên kurmançî, soranî û goranî bin jî daçekên “ra, era, raçe, werd/gord”ê hevterîbê şêwezarên kurdîya başûrî ne û nîşaneyê wê yekê ne ku şêxbizînî ser bi zarê başûrî ye.

-Çay **de** çaydane nemale. (Çay di çaydanê da çay nemale)

-**Le** baxça firê niştîn. (Em li baxçeyî gelek rûniştîn)

-**Je** min nepirsî. (Ji min nepirsî)

-**We** kere çî we ver pese. (Bi kerê çû ber pezî)

-**Ra** mal çê lazim e? (Ji bo malê çî lazim e?)

-**Weki** va vayî. (Wek bayî revî)

-**Era** nan nexward? (Çima nan nexwar?)

-**Heta** du salî we pa nekeft. (Heta du salan bi pêyan neket)

-**Qayşê** varîş da wivarî. (Mirov dibêje qey dê baran bibare)

-Le tela **werdi** îme cot kîrd. (Li zevîyê di gel me cot kir)

-**Gorditan** kar witaşî. (Bila di gel we kar hîn bibe).

Ji alîyê bikaranîna bazinedaçekên “de... (y)o, je... (y)o, we... (y)o”yê da jî hin cîyawazîyên şêxbizîni tîn dîtin ku beramberî wan di zarên din da pêşdaçek yan bazinedaçekên cîyawaz tîn bikaranîn. Ji vî alîyî ve “de... (y)o beramberî “di... ra”ya kurmancî, “je... (y)o” beramberî “ji... ve” û “ji”ya kurmancî, “we... (y)o” jî beramberî “ber bi”, “bi”, “bi... ra”ya kurmancî ne.

-**De** dê **yo** çî we mal. (Di gund ra çû malê)

-**De** çûl **o** birdînê. (Me ew di çolê ra bir)

-**Je** ban **o** kept. (Ji jor ve ket)

-Î awe **je** kwê **yo** diherikî. (Ev av ji çîyayî diherike)

-**Je** dwê **yo** nixweş im. (Ji duh ve nexweş im).

-**We** kêni **yo** vayî. (Ber bi kanîyê revî)

-**We** kêrdîk **o** hat. (Bi kêrekê hat)

-**We** sîyan **o** ceng kirdin. (Bi sê kesan ra şer kir).

3.6. Cîyawazîyên Lêkeran

Rewşa raderî ya lêkeran di şêxbizîni da herwek zarên kurdî yên din bi “-n”yê çê dibe û ji vî alîyî ve tu cîyawazîya wê nîne. Herweha dem jî tevî hin cîyawazîyên biçûk kêr zêde mîna zarên kurdî yên din e. Ji bo dîtina hevbeşî û cîyawazîyên deman bi rêya mînakekê em dê demên vî şêwezari berbiçav bikin:

Dema borî ya nêzik hem di kêşana erênî û hem jî di kêşana nerênî da bi temami mîna kurmancî û soranî ye. Mînak: kîştîm, nekîştîm... (Min kişand, min nekişand...)

Di dema borî ya dûr da li hember paşgira “-bû”yê ya kurmancî û soranî di şêxbizîni da bi guherîneke dengî “-bû” dibe “-wî”. Awayê nerênî jî herwek kurmancî û soranî bi paşgira “ne”yê çê dibe. Mînak: kîştîwîm, nekîştîwîm... (Min kişandibû, min nekişandibû...)

Dema borî ya berdewam mîna kurmancî û soranî ye. Gireya vê demê di awayê erênî da “di-” ye û bi tevahî mîna kurmancî ye. Di awayê nerênî da jî mîna kurmancî û soranî “ne” berî “di-”yê (di soranî da “de-”) tê bikaranîn. Mînak: dikîştîm, nedikîştîm... (Min dikişand, min nedikişand...)

Dema borî ya temam di nav zarên kurdî de xaleke cîyaker e, ji ber vê ev dem di şêxbizîni da jî xwedî taybetmendîyên xweser e. Dema borî ya temam di piranîya şêwezaren kurdî da li ser parenga dema borî (past participle) tê çêkirin (Kurdo, 2021, r. 181-182). Ev di kurmancî da bi “î/i”yê, di soranî da bi “û/w”yê û di şêxbizîni da jî bi “-ig/y”yê çê dibe. Di vê çarçoveyê da eger reha lêkerê bi dengnedêrê biqede “-ig” û eger bi dengdêra “î”yê jî biqede bi guherîna dengî “-y” tê bikaranîn. Lê eslê gireya vê demê “-ig” e û em di mînakên parengên borî yên mîna “mirdig”ê da (mirî) vê rastîyê bi zelalî dibînin. Mînak: kîştîgim, nekîştîgim, başo wîyîm, başo newîyîm... (Min kişandiye, min nekişandiye, ez baş bûme, ez baş nebûme...)

Di dema niha û dema bê da mîna hemû şêwezaren kurdî di şêxbizîni da jî reha lêkerê diguhere. Ji alîyê kêşanê ve rewşa erênî ya dema niha di şêxbizîni da mîna

kurmancî bi arîkarîya “di-”yê çê dibe, lê di awayê nerênî da mîna zazakî bi “nê-”yê çê dibe. Mînak: dikîşim, nêkîşim... (Ez dikîşînim, ez nakişînim...)

Ji alîyê dema dahatî ve şêxbizinî ji şêwezarên başûrî cuda dibe û mîna her du zarên kurmancî û zazakî yên bakurî tê bikaranîn. Ev dem di kurmancî da bi arîkarîya morfema “dê (wê, ê)”yê û gireya “bi”yê tê çêkirin ku berî lêkeran tê bikaranîn. Di zazakî da ev gire “do (yo/o/ko/go/yê/ê)” û “bi” ne (Malmîsanij, 2015, r. 212-213) û di şêxbizinî da jî “da (ha, a)” û “wi” ne. Herwek zarên din di şêxbizinî da jî ji alîyê cihê bikaranînê ve “da” serbest e û li gor cextkirinê cihê wê dikare bê guhertin. Lê “wi” mîna zarên din berî lêkera bingeînê tê bikaranîn. Herçî rewşa nerênî ya vê demê ye, herçend ji alîyê xelkî ve bi piranî wek nerênîya dema niha bê bikaranîn jî awayê wê yê formel jî tê bikaranîn û ev jî hevterîbê kurmancî dîsa bi “da” û “ne”yê tê çêkirin. Mînak: da wikîşim, da nekîşim... (Ez dê bikişînim, ez dê nekişînim...)

Di raweyên daxwazî da jî sîstema şêxbizinî hevterîbê kurmancî û soranî ye. Ji ber vê di rewşa erênî da berî lêkeran gireya “wi-”yê (bi-), di rewşa nerênî da “ne-”, di rewşên girîmananeyî û mercî da jî piştî reha lêkeran gireya “-a”yê tîn bikaranîn. Herweha wek bêjeyên van raweyan “xwezî/xweziko (xwezî/xwezîka), qayke (xwezî)” jî ji bo xurtkirina raweyên daxwazî tîn bikaranîn.

-Tike dik kê wikîştayn da baş **wi**wîya. (Me piçekî din ka bikişanda dê baş bibûya)

-**Bila** dereng **nemînî**. (Bila dereng nemine)

-**Xweziko** başo **wi**wim. (Xwezî ez baş bibim)

Ji bilî van kategorîyên giştî, bikaranîna hin lêkerên arîkar û kêşana hin lêkerên bêrist jî di nav şêwezarên kurdî da dibin pîvaneke cîyakerîyê û ji hev cuda dibin. Manaya karîne ya lêkeran yek ji van e ku di kurmancî da bi lêkerên arîkar ên “karîn” û “şîyan”ê, di zazakî da bi “eşkaneyene”yê, di soranî da bi “tiwanîn”ê û di şêxbizinî da jî bi “tanistin”ê tê çêkirin.

-Ewane **netanistin** ke lê din. (Wan nekarî lê bidin)

-Îwe **ditanin** ke î erxe okerin. (Hûn dikarin vî erxî vekin)

-Tu da **witanê** ke we pîyawî wiçê? (Tu dê bikarî bi peyatî biçî?)

Lêkera “hatin”ê di zimanê kurdî da gelek bikarber e û çendîn erkên wê yên cîyawaz hene. Herçend wek lêkera sereke û lêkera arîkar a pasîfkirinê bê bikaranîn jî ji bilî van erkên dîyar “hatin” di şêxbizinî da bi manayeke taybetî jî tê bikaranîn. Di vî bikaranînê da “hatin” di nav risteyên lêkdayî da manaya nêzîkbûna pêkhatina karekî dîyar dike û bi bêjeya girêdanê ya “ke”yê bi lêkera bingeînê ve tê girêdan. Bêguman ev mana di zarên din da bi bêjeyên cîyawaz tê pêkanîn. Eger em ji kurmancî mînak bidin ji bo vî manayê destebêjeya “hindik mabû”yê tê bikaranîn.

-Zarûwe **hat** ke wikefi û dalikê girtê. (Zarok hindik mabû bikeve lê dayika wî ew girt)

-Arige **hat** ke omirî û sergîn kirdin de sowa. (Agir hindik mabû vemire lê me sergîn kire sobeyê)

Hin lêkerên bêrist jî di nav şêwezarên kurdî da ji hev cuda tên bikaranîn. Ji nav van, lêkera “hebûn”ê ya herî berbiçav e ku di hin deman da nayê kêşan û di hin deman da jî ji rêçika xwe ya rêzimanî derdikeve. Cîyawazîyên bikaranîna vê lêkerê di nav zar û şêwezarên kurdî da bi piranî di dema niha da derdikeve. Di kurmancî û soranî da “hebûn” di dema niha da ji bo awayê erênî wek “he”yê û ji bo awayê nerênî jî wek “nîn/nî”yê tê bikaranîn. Di zazakî da radera vê lêkerê dibe “estbîyene” û di dema niha da awayê wê yê erênî dibe “est” û awayê wê yê nerênî jî dibe “nî” yan jî “çin” (çi+nî=çin). Ev lêker, di şêxbizinî da bi guherîneke biçûk a dengî herwek kurmancî û soranî bi awayê “hewîn”ê tê gotin lê di dema niha da ji wan cuda dibe û di forma erênî da dibe “hest” û di forma nerênî da jî dibe “(h)ijnî”.

-De baxçat çen vîne dari sîw **hestin**? (Li bexçeyê te çend cure darê sêvan hene?)

-Tu jî de tupanêye **hestê** yan **ijnîyê**? (Tu jî di topaneyê (futbol) da heyî yan nînî?)

-Ewane tiştikêyan **ijnîye**. (Tiştêkî wan nîne.)

Heman rewş di raweya fermanî ya lêkerên “hatin” û “çûn”ê da jî derdikeve holê. Lêkera “hatin”ê di raweya fermanî da di kurmancî û soranî da wek “were-werin”ê tê bikaranîn û ji rêzika giştî ya raweya fermanî derdikeve. Ev lêker di zazakî da wek “amayene”yê tê bilêvkirin û di raweya fermanî da li gor rêzikên kêşana fermanî wek “bê-bêrê”yê tê bikaranîn. Lê wek kurmancî û soranî di şêxbizinî da jî kêşana fermanî ya vê lêkerê ji rêzika giştî ya lêkerên din derdikeve û wek “boro-borin”ê tê bikaranîn.

-Tu **boro**. (Tu were)

-Îwe **borin**. (Hûn werin)

Mîna “hatin”ê lêkera “çûn”ê jî di raweya fermanî da ji rêzika rêzimanî derdikeve. Ji ber vê di kurmancî da bi “here-herin”ê û li hin deverên berteng li gor rêzika rêzimanî bi awayê “biçe-biçin”ê tê bikaranîn. Di soranî da awayê fermanî ne li ser reha “çûn”ê li ser reha “royîştin”ê bi awayê “biro-biron”ê tê bikaranîn lê kêmanî be jî bikaranînên wek “biço-biçon” jî tên dîtin. Di zazakî da radera vê lêkerê “şîyene/şîyayene” ye û di vî zarî da jî ev lêker di awayê erênî yê raweya fermanî da ji rêzikê derdikeve û wek “şo-şorê”yê tê bikaranîn. Ev lêker di şêxbizinî da wek “çîyin”ê tê bilêvkirin û bikaranîna wê kêmanî mîna kurmancî ye. Ji ber vê di forma erênî da wek “hero-herin”ê tê bikaranîn û ji rêzikê derdikeve.

-Tu **hero**. (Tu here)

-Îwe **herin**. (Hûn herin)

4. Taybetmendiyên Ristesazîyê di Şêxbizinî da

Ji alîyê ristesazîyê ve şêxbizinî mîna zarên kurdî yên din e lê ji alîyê ravekan û hin hûrgilîyên din ve hin cîyawazîyên wê hene. Ji ber vê em dê di vê binbeşê da bal bikêşin ser van xalan û di hin kategorîyan da risteyên şêxbizinî di gel kurmancîya wan destnîşan bikin.

4.1. Ravek

Ravek yekeyên herî biçûk ên ristesazîyê ne. Ji alîyê rêzbandîya bêjeyan ve ravekên hemû zarên kurdî mîna hev in, lewra di hemûyan da ravekirî bêjeya yekem û raveker jî bêjeya duyem e. Herweku li jor jî amaje pê hat kirin ev bêje bi rêya veqetandeka “i” û “ê”yê bi hev ve tîn girêdan, lê wek awarte eger dawîya ravekirîyê bi dengên “a” û “e”yê biqedin veqetandek nayên bikaranîn. Di zimanê rojane da ne tenê bêjeyên ku bi van tîpan diqedin, hemû ravekirîyên ku bi tîpên dengdêr diqedin bi mebesta sivikkirinê veqetandeka “i”yê wernagirin.

Ji bilî vê rûdana dengî ji alîyê giştîbûn û nasyariya bêjeyan ve ravekên şêxbizînî dibin çar kategorî: (1) Eger ravekirî giştî be veqetandeka “i”yê û raveker nasyar be gireya “e”yê werdigirin, (2) Eger ravekirî nasyar be veqetandeka “ê”yê û raveker giştî bin gireya nenasyariyê ya “îk/î”yê werdigirin, (3) Eger ravekirî û raveker nasyar bin ravekirî veqetandeka “ê”yê û raveker jî gireya “e”yê werdigirin, (4) Herî dawî eger ravekirî û raveker giştî bin ravekirî “i”yê werdigire û raveker jî xwerû dimîne. Ji vî alîyê ve şêxbizînî ji zarên kurdî yê din cuda dibe û taybetmendîyeke xweser nîşan dide.

Mînakên ravekirîyên giştî û ravekerên nasyar: pelki dare (pelê darê), girdi temezîye (dora temezîyê), gîfiki şallem (berîka şalê min), sa dare (siha darê), pa mirge (pêyê mirîşkê)...

Mînakên ravekirîyên nasyar û ravekerên giştî: girdê temezîyîk, pelkê dari...

Mînakên ravekirî û ravekerên nasyar: pelkê dare (pelê darê), dendikê gulxwere (dendika gulberojê), hakê mirge (hêka mirîşkê), şîrê bizine (şîrê bizinê)...

Mînakên ravekirî û ravekerên giştî: tûzi cil (toza cilî), dendiki gulxwer (dendika gulberojê), haki mirg (hêka mirîşkê) tavuk yumurtası, şîri bizin (şîrê bizinê)...

Ev cure raveker li gor taybetmendîya giştîbûn û nasyariya xwe dikarin bi hev ve bîn girêdan û ravekên zincîrî bîn pêkanîn.

Pelki dari zerdelî (pelê dara zerdelîyê) (giştî-giştî-giştî)

Pelkê darê zerdelîye (pelê dara zerdelîyê) (nasyar-nasyar-nasyar)

Pelkê dari zerdelî (pelê dara zerdelîyê) (nasyar-giştî-giştî)

4.2. Risteyên Lêkerî

Têperî û tîneperî di sazkirina risteyên kurdî yê dema borî da xaleke cîyaker û giring e. Ev cîyawazî ji alîyê rêkkeftina biker û pêveberê û bikaranîna cihnavên kesî yê likandî ve derdikeve pêşîya me. Kêşana lêkerên tîneper di hemû zarên kurdî da di bin hikumê bikerê da ye lê dema ku pêveber lêkereke tîper be li gor zaran rewş diguhere. Di zarên bakurî yê mîna kurmancî û zazakî da ji ber rêzika ergatîfîyê di pêveberên lêkerên tîper da lêker dikevin bin hikumê berkarê lê mîna şêwezarên din ên navîn û başûrî di şêxbizînî da ji ber nebûna ergatîfîyê rêkkeftina biker û pêveberê di van lêkeran da jî berdewam dibe û bê cîyawazîya tîperî û tîneperîyê hemû lêker li gor bikerê tîn kêşan.

Îme giran giran kar dikirdîn. (Me giran giran kar dikir)

Îme hatîn we mal. (Em hatin malê)

Di risteyên lêkerên têper ên dema borî da eger berkar berê hatibe destnîşankirin ji bo dubarenekirina berkarê piştî pêveberê gireya “-ê”yê tê bikaranîn û ev gire şûna berkarê digire. Ev rewş di kurmançî da di mînakê hin lêkerên mîna “dan”ê da (Min dayê) derkeve pêşîya me jî ji bo hemû lêkeran nayê bikaranîn. Lê ev yek di şêxbizînî da ji bo hemû lêkerên têper bi awayekî sistematîk tê bikaranîn.

Min pirtale şûrtim (Min cil şûşt) → Min şûrtimê (Özgür, 2024)

4.3. Risteyên Pasîf

Mîna kurmançî di şêxbizînî da jî pasîfîkirina lêkeran bi rêya lêkera “hatin”ê tê çêkirin (di dema niha da dibe “-ay”) lê ji kurmançî cudatir di şêxbizînî da piştî “hatin”ê daçeka “we”yê dikeve navbera “hatin” û lêkera bingehîn. Herwek tê zanîn daçeka “we”yê erka arastekirinê digire ser xwe û beramberî vê daçekê di kurmançî û soranî da daçeka gireyî ya “-e”yê tê bikaranîn. Ev “-e” di hin devokên kurmançî da di rewşa pasîf da hîn jî tê bikaranîn. Ji bilî vê cîyawazîyê ji alîyê rêzbandîya beşên sereke yên risteyan ve tu cîyawazî di navbera şêxbizînî û kurmançî da nîne û pêşî berkar û paşê jî pêveber tê bikaranîn.

-Arige nehat we omirdin. (Agir nehat vemirandin)

-Zarû î gave qe dîyay we xelitandin? (Zarokên vê gavê qet tên xapandin?)

-Î nane nîyay we xwardin. (Ev nan nayê xwarin)

-Î dargele da way we birandin. (Ev dar dê bîn birîn)

4.4. Risteyên Hekarî (Causative Sentences)

Dema ku bikera risteyê karê xwe bi yekî din bide kirin avanîya hekarî ya riste-yan çê dibe. Ev di hemû şêwezarên kurdî da bi arîkarîya morfema “bi”yê (be/we) û lêkera “dan”ê tê çêkirin lê ji alîyê rêzbandîyê ve di navbera wan da hin cîyawazîyên biçûk hene. Di şêxbizînî da ji bo çêkirina risteyên hekarî morfema “we”yê û lêkera “dan”ê tê bikaranîn lê ji alîyê rêzîkirina wan ve hinek cîyawazîyên wê hene. Xala cî-yaker a şêxbizînî di vê da ye ku morfema “we”yê ne berî “dan”ê berî lêkera bingehîn tê bikaranîn. Ev bikaranîn di kurmançîya devera Mêrdînê da jî tê dîtin. Di vê çarçoveyê da eger kesê ku kar pê tê kirin neyê gotin di şêxbizînî da rêzîkirin weha ye: biker+berkar+morfema “we”yê+lêkera bingehîn+lêkera “dan”ê. Lê eger kesê ku kar pê tê kirin bê gotin rêzbandî weha çê dibe: biker+berkar+morfema “we”yê+berkara nerasterast+morfema “we”yê+lêkera bingehîn+lêkera “dan”ê.

-Tu kare **we** kirdin **de** (Tu kar bide kirin)

-Tu meytûwe we ewî **we** xwendin **de**. (Tu nameyê bi wî bide xwendin)

4.5. Risteyên Pirsyarî

Herwek zarên din di şêxbizînî da jî risteyên pirsyarî yan bi guvaş û dirêjkirina kîteya dawî ya bêjeya dawî yan jî bi arîkarîya bêjeyên pirsyarî tên çêkirin. Bêjeyên

pirsyarîyarîyê yên mîna “kê (kengê), çend, çûn (çawa/çawan), kî, çe (çi) çi qes (çi qas) ko/ku (li ku)” bi piranî herwek zarên din in lê bêjeyên raçe (bo, çima) era (çira/çima) taybetî şêxbizînî ne.

Tu î nûmerîye nan **xwardê**? (Te vê nîvroyê nan xwar?)

Arige **disûzî**? (Agir dişewite?)

Dapîrikê tu **kê** hatige we dunya? (Dapîra te kengê hatîye dinyayê?)

Çend cift gûre sendê? (Te çend cot gore stend?)

Îwe yekitînî **çûn** nasîn? (We hev çawa nasî?)

Le îre **le çe** digerdin? (Li vir li çi digerin?)

Î destite **raçe** swêr e? Bu ellerin neden kırmızı? (Ev destê te çima sor e?)

Era kirdin we qîreqîr? (Çira we qîreqîr kir?)

Îwe giran giran **ko** diçin? (Hûn giran giran diçine ku?)

Şûn karetan **le ku** we? (Cihê kare we li ku ye?)

4.6. Risteyên Lêkdayî

Ev cure riste jî herwek zarên din tîn sazkerin û ji vî alîyî ve tu cîyawazîyeke şêxbizînî nîne. Ji bo dîtina vê li risteyên jêrîn binêrin:

-Tikey vista û xatir xwest. (Piçek rawesta û xatir xwest)

-Pirtalê terr e û nêkenîkê. (Cilê wî şil e lê ji xwe nake)

-Ewî dewlemend e ama tikey çêwteng e. (Ew dewlemend e lê piçek çavteng e)

-Baş e baş e boro ke weqêr e. (Baş e baş e lê/were ku hêrsok e)

-Vevîyê nûweman him baş e him jêhatig e. (Bûka me ya nû hem baş e hem jî jêhatî ye)

-Ne arewî çasîya ne îngilîzî çasîya. (Ne erebî hîn bû ne jî îngilîzî hîn bû)

4.7. Risteyên Sedemî

Ev riste bi arîkarîya bêjeyên girêdanê yên mîna “ra ewe, ra eye, je, je ver, sewi..” tîn çêkirin û sedema bûn yan nebûna tişteki dîyar dikin.

-Nixweş wî ra ewe serê îçîyag wî. (Nexweş bû ji ber wê serê wî pêçayî bû)

-Dare huşk kirdiwî ra eye birrînê. (Dar hişk bû ji ber vê me ew birî)

-Je ver varîşe cay cilgel neşûrtîn. (Ji ber şilîyê me xalî neşûştin)

-Sewi qirreqirretan dengi mella wêman negîya. (Seba qireqira we denge melayî nehate me)

4.8. Risteyên Armançî

Ev riste, bi bêjeya girêdanê ya “ke”yê tîn çêkirin ku dikeve navbera hevoka bingehîn û hevoka armançî.

-Henî dar hawird ke onîkê. (Hinek dar anîn ku daîne)

-Sowa xist wê ke hundurîn germo wû. (Sobe pêxist ku hundir germ bibe)

4.9. Risteyên Mercî

Ev riste jî bi arîkarîya bêjeyên girêdanê yên mîna “ke, heta ke, eger, şayet”ê tên çêkirin.

-Ke lamba disûzî okuşê. (Ku lembe pêdikeve vemirîne)

-Heta ke karet birew nekerê perat wêt nedim. (Heta ku tu karê xwe baş nekî pe-reyê te nadim)

-Eger ke dare gul da da wigirî. (Eger ku darê gul da dê bigire)

Encam û Nirxandin

Serborî û koça şêxbizinîyan nîşan didin ku bingeha vê hozê digihîje derûdora Kirmanşahê. Ji vî alîyê ve herwekî dabeşkarîya Tewfîq Wehbî (1973, r. 31) şêxbizinî beşek e ji kurmançîya başûrî ku ji kirmanşahî, kelhûrî, lekî, feylî, bextyarî û mamesanî pêk tê. Jixwe vekolînên berî me jî bêtir ku ji keresteyên zimanî sûd wergirin ji daneyên dîrokî digihîjin wê encamê ku şêwezarê şêxbizinî nêzî lekî û feylî ye (Gökpınar-Geliş, 2016, r. 32).

Di encama vekolîna me ya li ser daneyên zimanî yên şêxbizinîyan jî derket ku zimanê şêxbizinîyan ku niha di nav sînore Tirkîyeyê da tê axaftin şaxeke kurdîya başûrî ye lê ji ber guherîna cografî û koçberîya wan di hin kategorîyan da karîgerîya kurmançî jî li ser çê bûye. Bi giştî guherîn û rûdanên dengî yên şêxbizinî hevterîbê guherîn û rûdanên dengî yên zarên kurdî yên din in û ji vî alîyê ve taybetmendîyên giştî yên zimanê kurdî nîşan didin. Tevî vê gava ku mirov dengên vî şêwezarî li ber çavan digire bi giştî taybetmendîyên kurdîya başûrî dinimîn.

Taybetmendîyên teşenasîyê yên şêxbizinî jî heman boçûnê piştrast dikin. Ji vî alîyê ve pirhejmarîya navdêran ku di şêxbizinî da bi gireya -gel (-yel/-el)ê çê dibe, yek ji xalên cîyaker ên vî şêwezarî ye ku wê ji zarên bakûrî û navîn cuda dike û bi kurmançîya başûrî ve girê dide. Bi heman awayî ji alîyê awayê nasyar ê navdêran ve jî şêxbizinî ji zarên bakûrî cuda dibe û ji bilî çend awarteyên dengî di hemû rewşan da bi gireya “-e”yê tê nasyarkirin. Ev jî wek gireya pirhejmarîyê yek ji xalên cîyaker ên şêxbizinî ye ku wî ji zarên bakûrî û heta radeyekê soranî cuda dike.

Taybetmendîya nasyarîyê di rengdêrên çawanîyê da jî xwe nîşan dide û dibe xaleke taybetmend a şêxbizinî. Lewra ev rengdêr dema ku bi awayekî giştî tîn bikaranîn navdêr veqetandeka “-î”yê û rengdêr jî bi awayekî xwerû tîn bikaranîn lê dema ku kes yan tiştê ku tê behskirin dîyar û nasyar bin navdêr veqetandeka “-ê”yê û rengdêr jî gireya nasyarîyê “-e”yê werdigirin. Taybetmendîya nasyarîyê ne tenê di rengdêrên çawanîyê da, di rengdêrên nîşane û rêzekî da jî xwe nîşan dide. Ji bilî nasyarîyê rengdêrên dabeşker ên şêxbizinî jî cîyawaz û taybetî vî şêwezarî ne ku ji bo nîşandana dabeşkerîya rengdêran berî rengdêra hejmarî ya bingeîn “yek” tê bikaranîn û bi vê yekê tê nîşandan ku ew hejmara rengdêr bi ser çend koman da hatîye dabeşkirin.

Bikaranîna daçekan di nav şêwezarên kurdî da xaleke guherbar û cîyaker e. Ji

bilî çend bazinedaçekan hemû daçek di şêxbizinî da wek pêşdaçek tên bikaranîn. Herçend piranîya van daçekan mîna şêwezarên kurdî yên din bin jî mînakên “ra, era, raçe, werd/gord”ê taybetî şêwezarên başûrî ne. Ji bilî vê, bikaranîna daçekan di nav şêwezarên kurdî da xwedî hin cîyawazîyên manayî û teşeyî ne jî. Ji vî alîyê ve divê em destnîşan bikin ku bikaranîna bazinedaçekên “de... (y)o, je... (y)o, we... (y)o”yê yên şêxbizinî di zarên din da bi pêşdaçek yan bazinedaçekên cîyawaz tên bikaranîn.

Ji alîyê bikaranîna lêkeran ve tevî hin guherînên dengî awayê rader, dem û raweyên daxwazî yên şêxbizinî herwek kurmançî û soranî ye. Tenê di dema borî ya temam da ji ber cîyawazîya parenga dema borî şêxbizinî ku bi “-ig/y”yê çê dibe, xwedî cîyawazîyekê ye û ji alîyê bikaranîna dema bê ve jî ji zarên navîn û başûrî cudatir herwek kurmançî û zazakî ye.

Herî dawî ristesazîya şêxbizinî di çarçoveya giştî ya ristesazîya zarên kurdî da ye lê ji alîyê hûrdekarîyan ve hin cîyawazîyên wê hene. Di ravekan da rêzbendîya bêjeyan herwek zarên din be jî ravekirî û raveker ji alîyê giştîbûn û nasyarîyê ve morfemên cîyawaz werdigirin û bi giştî ravekên şêxbizinî çar kategorîyên cîyawaz pêk tînin. Ji alîyê çêkirina risteyên lêkerî ve şêxbizinî rêzikên giştî yên ristesazîya zarên navîn û başûrî dinimîne û bê cîyawazîya lêkerên têper û teneper di hemû rewşan da pêveberên lêkerî li gor bikerê tên kêşan û ji bo dubarenekirina berkarê jî morfema ku berkarê dinimîne diçe ser lêkerê. Sîstema risteyên pasîf ên şêxbizinî ji soranî û goranî cudatir herwek kurmançî ye û lêker bi arîkarîya lêkera “hatin”ê tên pasîfkirin. Heman rewş di risteyên hokarî da jî tê dîtin û ji bilî hin hûrdekarîyan pergala şêxbizinî herwek zarên kurdî yên din bi morfema “we”yê û lêkera arîkar a “dan”ê tên çêkirin. Ji bilî van hûrdekarîyên biçûk em dikarin bibêjin ku pergala ristesazîya şêxbizinî herwek zarên din e û tu cîyawazîyeke wê ya berbiçav nîne.

Extended Abstract

Sheikhbizinish is a third variety of Kurdish spoken in Turkey, a subdialect of Southern Kurdish, after Kurmanji and Zazaki. This sub-dialect is a branch of the southern dialect of Kurdish and is spoken by the Sheikhbizini tribe. When we look at the narrations expressing the name and formation of the tribe, we see that this tribe was formed around the miracles of a charismatic sheikh. When we look at historical sources, we see that the homeland of this tribe is today Iran; but in the 16th century, as a result of the Ottoman Safavid conflict, it migrated to Ottoman lands and spread over a wide geography. Although the Sheikhbizinis in Iraq eventually gave up using their own dialect and started using Sorani Kurdish, the Sheikhbizinis in Turkey managed to maintain their dialect at a spoken level. With this article, we aim to explain the distinctive features of Sheikhbizinish spoken in Turkey and to determine its place among other dialects and subdialects of Kurdish. Therefore, we focus more on the differences of Sheikhbizinish and try to compare it with other dialects of Kurdish. In terms of showing the phonetic features of Sheikhbizinish and the general sound changes in Kurdish, we touch on the sounds $b \rightarrow w$, v , $l \rightarrow r$, $r \rightarrow l$, $d \rightarrow r$, $d \rightarrow y$, $g \rightarrow x$, $j \rightarrow c$, $\zeta \rightarrow t$ as examples of consonant changes; the sounds $\hat{e} \rightarrow \hat{i}$, i , $e \rightarrow \hat{i}$ as vowel changes; the sound drops and the sound changes such as the transformation of “e” into “a”, “i” into “u” and “e” into “o” as a result of the drop of “w”. Apart from this, we examine the drop of the “e” sound in compound words and the metathesis event that occurs in the examples “jî→îj” and “le→el”. When we look at the morphological features of Sheikhbizinish, the absence of gender and inflection in nouns in this sub-dialect and the systematic use of the rule of definition with the suffix “-e” in nouns and adjectives are features that distinguish it from the northern dialects and put it in the category of the southern dialect. Similarly, the pluralization of nouns with the suffix “-gel” (-yel/-el) is an obvious feature of the southern dialect. This situation is also encountered in the subject of pronouns. The system of single personal pronouns and the use of pronouns in the form of suffixes in Sheikhbizinish, in contrast to the dual personal pronoun system of the northern dialects, confirm this situation. The issue of generic and definition in adjectives is also a striking feature of this sub-dialect, unlike the northern dialects. Due to this feature, when adjectives are used generic in Sheikhbizinish, they are used plainly, but when they are used definite, they take the definite suffix “-e”. Although the use of prepositions in Sheikhbizinish generally parallels the Kurmanji, Sorani and Gorani dialects and has a preposition and circumposition system, it differs from these dialects with its prepositions such as “ra, era, raçe, werd/gord” and it is useful to state that some circumpositions are represented by different prepositions in other dialects. Although it generally reflects the characteristics of other Kurdish dialects in terms of verbs, it has some distinctive features. This subdialect is distinguished from Kurmanji and Sorani by the use of the past perfect tense, and unlike them, it is made with the past participle suffix “-ig/-y”. Although the positive use of the present tense is like Kurmanji and

Sorani, the negative suffix of the present tense is like Zazaki. In the future tense, it differs from Sorani and Gorani and conforms to the usage of Kurmanji and Zazaki with some minor sound changes. Sheikhbizinî is similar to other Kurdish dialects in the subjunctive and conditional tenses and does not have a different usage. Apart from these, we come across different usages of some auxiliary and irregular verbs in the Sheikhbizinî sub-dialect, as in other Kurdish dialects. Examples of these are the use of the verb “hatin” in the sense of “to get closer”, the use of the auxiliary verb “tanistin” for “sufficiency”, the use of the verb “hewîn” in the present tense as “hest” in the positive and “(h)ijni” in the negative, the use of the verb “hatin” in the imperative form as “boro-borin” irregularly, and the use of the verb “çûn” in the form of “hero-herin”. Finally, in terms of syntax, Sheikhbizinî has some minor differences, although it shares the general characteristics of other dialects of Kurdish. According to our study, the biggest difference is in the izafe suffixes that form the complements. According to the generic and definiteness features, four different complements are encountered in Sheikhbizinî. Accordingly, (1) if the complement is generic, it takes the “-î” suffix, if the complement is definite, it takes the “-e” suffix, (2) if the complement is definite, it takes the “-e” suffix, if the complement is generic, it takes the “-îk/-î” suffix, (3) if both the complement and the definite are definite, the “-ê” suffix is added to the complement, and the “-e” suffix is added to the complement (4) finally, if both the complement and the definite are generic, the complement takes the “-î” suffix, and the complement is used plain. Apart from this, unlike the northern dialects which have the ergative rule in verb sentences, in Şeyhbizîne, there is subject-predicate agreement in all verbs without any difference between transitive and intransitive verbs, in accordance with the characteristics of the central and southern dialects. Apart from this, it should be noted that Şeyhbizîne has the same characteristics as the main dialects of Kurdish, except for the sound change and some other minor differences in other categories. As a result, when we consider the phonetic, morphological and syntactic characteristics of Şeyhbizîne, we reach the conclusion that this sub-dialect is a branch of the southern dialect of Kurdish, but over time it has come under the influence of Kurmanji.

Çavkanî / References

- Ali Bedir Han, C. - Lecot, R. (2004). *Kürtçe Gramer (Kurmanci Lehçesi)*. İstanbul: Avesta.
- Aydın, S. – Çiftçi, E. (2021). *İmparatorluğun Son Aşiret Sayımı Fihristü'l Aşâir Yorumlar ve Çeviriyazım*. İstanbul: İletişim Yayınları.
- Bedlîsî, Ş. (2007). *Şerefname*. (Wer. Ziya Avci) (Çapa Duyem). İstanbul: Avesta.
- Bozkurt, İ. (2021). *Aşiretler Tarihi*. İstanbul: Nûbihar.
- Dogan, M. (2007). Hawar Rinde Mîn Suzande. https://youtu.be/G9vBzeqEQws?si=Sbh-UtOAKYgJS_U. Dîroka Wergirtinê: 05.04.2025
- Fiğan, M. (2022). Anadolu'nun İçlerine Yönelen Bir Yolculuğun Hikâyesi: Şeyh Bızın Aşireti. *Aktör, Müttetik, Şakî Kürt Aşiretleri*. (Derleyenler: Tuncay Şur – Yalçın Çakmak). İstanbul: İletişim Yayınları. (443-459).
- Gökpinar, M. - Gelîş, A. C. (2016). *Lek Kürtleri Çukurova Lekvanikleri Haymana Lek Şahbazanları Bingöl Bermeki Lekleri*. İstanbul: Do Yayınları.
- Hawar (1932). Armanc, Awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê. *Hawar*, 1, 1-2.
- Koyî, H. Q. (1390). *Dîwanî Hacî Qadirî Koyî*. Serdar Hemîd Mîran û Kerîm Mustefa Şareza (Lêkolînewe û Lêkdanewe). Sine: Billawkirdnewey Kurdistan.
- Kurdo, Q. (2021). *Rêzimana Kurdî Kurmancî-Soranî*. (Wer. Zülküf Ergün) (Çapa Duyem). İstanbul: Nûbihar.
- Lewendî, M. (1997). Kurdên Şêxbizînî. *Bîrnebûn*, 3, 78-98.
- Malmîsanij, M. (2013). *Kürtçede Ses Değişimi*. İstanbul: Vate.
- Malmîsanij, M. (2015). *Kurmancca İle Karşılaştırmalı Kırmancca (Zazaca) Dilbilgisi*. İstanbul: Vate.
- Şêxbizênî, M. S. F. Y. (2015). *Hozî Şêxbizênî*. Hewlêr: Çapxaney Zankoy Selaheddîn.
- Özgür, M. E. (2024). Şeyhbızını Lehçesi Geçişli Fiilerde Nesne. <https://www.rudaw.net/turkish/opinion/02062024>. Dîroka Wergirtinê: 16. 03. 2025.
- Özgür, M. E. (2024). Şeybızını Lehçesi – “Tanımlılık”. <https://www.mardinlife.com/kose-yazisi/seybizini-lehcesi-tanimlilik>. Dîroka Wergirtinê: 14.04.2025.
- Özök, M. (1998). *Haymana Şêsbızınları Üzerine*. *Bîrnebûn*, 4, 14-24.
- Perrot, G. (2021). *Haymana Kürtleri*. (Çev. Heval Bucak). İstanbul: Avesta.
- Türkay, C. (2012). *Başbakanlık Arşivi Belgelerine Göre Osmanlı İmparatorluğu'nda Oymak Aşiret ve Cemaatlar*. İstanbul: İşaret Yayınları.
- Wehbî, T. (1973). Eslî Pîte Qalîy Şêwey Silêmanî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 1, Beşî 1, 9-38.
- Yıldız, P. (2023). *Dimilîyê Modanî û Fekê Înan*. Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, Diyarbakır.

Yıldız, P. (2025). Xususîyetê Morfolojîk yê Fekê Licê. *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 13 (1), 92-130.

Yurtdaş, E. (2018). *Geçmişle Buluşan Haymana*. Ankara: Haymana Belediyesi Kültür Yayınları.

Yusupova, Z. (2017). *The Kurdish Dialect Gorani A Gramatical Description*. Saarbrücken: Lap Lambert Academic Publishing.

Hevpeyvîn

Burhan Özçelik, Düzce, 10. 04. 2025.

Cemal Şadan, Aralık/Iğdır, 13. 10. 2024.

Cömert Amca, Ataköy/Haymana/Ankara, 16. 08. 2023.

Hacı Murat Yılmaz, Kürt Tınaz Mahallesi/Düzce, 26. 07. 2023.

Hamza Aksoy, Paşapınarı/Havza/Samsun, 17. 06. 2024.

Mehmet Öksüz, Karaçalılık/Akyazı/Sakarya, 08. 07. 2024.

Muhammed Ali Camcı, Gökçebelen/Durağan/Sinop, 13. 10. 2024.

Sami Yatmaz, Gökçebelen/Durağan/Sinop, 13.10. 2024.

Tayyar Üstün, Sindiran/Haymana/Ankara, 28. 01. 2020.